



Hejmar (7)

15 - Berçile - 2013

Çandî - Giştî - Serbixwe - Nîvmehane ye

Serê Kaniyê  
Bajare Biratijê



welat.press@gmail.com

[www.facebook.com/Dengekurdistanasurya](https://www.facebook.com/Dengekurdistanasurya)





## Zivistana zarokêñ penaber



Zivistan her sar dimîne û tiştê ku serma wê xurtir dike dema ku mirov dûrî cih û warê xwe be , di vê Zivistanê de ku li hemî deveran li dunyayê sobe têne vêxistin , zarokêñ kurd ên penaber li herêma Kurdistanê ji ber dûrbûna ji mal û hevalên xwe li welêt, zivistan bi sermak zortir tê bi ser wan de , bê ku diyar be kengî ew zarok li kolanêñ xwe li rojava vegeerin

Di vê zivistanê de û ji bo ew zarok hinekî kêf xweş bibin ji her kesekî li derveyî welêt tê xwestin ku wan zarokan di bîra xwe de bîne û destê alîkariyê bide wan , da ku karîbin sobeyeke xwe deynin , agir têde vedin û dest û tiliyên xwe yên biçûk li ber wê gerim bikin .

Ji her yekî ji me tê xwestin ku karîbe alîkariya malbatekê bike , ji ber ew zarok yan yê birakî ye , yan yê cîranekî ye.

Bela em xwe nêzîkî wan zarokêñ penaber bikin , da ku ew sibê di avakirina vî welatî de beşdar be.

Aras Yûsiv



# Welat û Şores

Ezîz Xemcivîn


Welat di rewşike pir aloz de ye, nikarim ji we re pesnê rewşê bidim, Her tişt ew xwe şirove dike. Lê nikarim derdê miletê xwe jî neguhêzim. Miletê Kurd di rewşike cudatir de, di rewşike man û nemanê de ye. Lê heta çi radeyê serkêşen milet li rewşê haydar in, ev pirs pir giring e. Hestiyariya serdemê pir dihêle ko em metirsîya xwe bidine diyar kirin.

Şoreşa miletê Sûriyê ya xwîndayî, buhayê azadiyê di nirxê wê de daye, lê heta nuha biser neketiye. Hem ji sedemên hundirîn û hem jî sistema Cîhanî ya ko rûxandina Rêjîmê di ecindeyên wê de nîn e.

Lê yên ko dibin gorî ew xelkên bêguneh ko di navbera du agiran de têne sostin. Lê tev wisa jî milet hêj liber xwe dide, tev ko rewş lê pir teng bûye. Ji hêla abûrî, birçîbûn û kuştin jî pir bandora xwe li ser jiyanâ rojane kiriye. Nuha jî bi parçekirina Tevgera xwe bêtir dêşe. Hin Partiyê ko nêzîkî Rêjîmê ko milet wisa wan dibîne, û Çek eşkere digel hêza Rêjîmê hilgirtine, û hem jî bervedêriyê di ber Rêjîmê de dikin. Ew jî li ser serê miletê belengaz bûne Rêjîm, û li hin deveran milet sed xweziya xwe bi desthilatdariya Rêjîmê tîne. Hin fişarê didin ser milet, hin baceyê lê zêde dikin. Ew hemû li ser serê xelkên bê guneh bûne Rêjîm. Eger berê bi yekî bûn nuha bi dehan in. Rêyên bajarên mezin mîna Heleb û Şam li hev parve kirine, Çete ew Desthilatdar in, kî nexweş an tengav be nikare xwe bigihîne ewan bajaran.

Dîsa jî ez dixwazim li ser rewşa miletê Kurd bi taybetî binivîsînim, bi hêvî me ko Partî û Rewşenbîrên me di evê qonaxa herî hestiyar de bi rola xwe rabin, ev berpirsiyariyeke dîrokî ye. Parçebûn û cudahiya Tevgerê ziyaneyeke mezin digihîne milet û kêşeya Kurdi li hundir û derveyî Sûriyê. Siyasî,

Vêca ci ji me tê xwestin, taybetî tevgerên Rewşenbîrî, Rêx-istinê Sivîl, Partiyê heta ji me bê em bi ser hev de bin û nêzîkî hev bibin û bi yek helwestê bin. Bi kêmanî di evê serdema pir teng de, gava dijmin yekî Kurd dikuje nabêje ev ji kîjan Partiyê ye, an ji kîjan Eşîrê ye. Yekîti tenê ew dikare me ji evê talokeya han rizgar bike. Eger hêzên me ne yek bin, ew tu rûmetê nabînin, çimkî yeka yek, ewê nikaribin karekî ji bo miletê xwe bikin. Serkeftin ji bo Şoreşa Sûriyê



## Çanda lêborînê û pêkvejiyanê di nav Kurdan de

Rojavayê kurdistanê ji mêj ve tê nasîn ku çavkaniya lêborînê ye, Surişteke rengîn e bi taxên xwe , Û pêkvejiyana aştiyane. Bi hemû ol û ayinên xwe çi Kurd ,Ereb ,Aşûr, û Suryan , Èşen xwe bi hev re di temirînîn û şahîyen xwe bi hev re vejîn dikin . di dîrokê de jiyanek hevbeş bi hev re berdewmdikirin tu carî olperistî û tundî di nav wan de nebû Lewra gelek caran rîjîmê di xwest ku tevliheviyê di nav wanxe bi taybet pişî destpêka şoreşê . Lê hişmend û serkanêwan di karîbûn van pilanan dûr bixin Kurd wek hatne naskirin ,miletke aşîtxwaze,û li ser çanda lêborînê perwerde bûye,ji ber ku surûşta kurdistanê,mozayîke ke rengawrenge,û gelek ol û regezan himêz dike,lewra eger merov lêkolînekê jî dîroka kurdan re çê ke ,wê bê naskirin ku çanda tundrewî,çî caran cihê xwe di nav vî gelî de nedîtiye. Raste kurdên rojava dilsozin bi pisgirêka xwe re Lê qet benaberî jî nexsistin nava xwe û texên dîtir û xwe li ser ti ol û ayinan re ne didîtin Tenê daxwaziyên wan di Sûriya nû de . Welatekî azad Ku tê de bi aştiyane, Û wekhevî bi hemû pêkhatiyan re bijîn.

Efsanê amûdê..... Alan alûcî



## Tundiya siyasî li dijî jinê li Rojavayê Kurdistanê

Di roja cîhanî de ya Na ji tundiyê re li dijî jinê, gelek axaftin hatin kirin û gelek semînar û xwepêşindan û agahî li darketin li tevahiya cîhanê, û li navçeya me ya Rojavayê Kurdistanê gelek rôxistin ji gelek aliyan ve ev çalakî lidarxistin, lê hêjaye gotinê ku divê bê xuyakirin ku astengî û aloziyên jina Kurd li Rojava ci ne?

dûrî daxuyaniyên siyasî ez dibînim ku rewşa siyasî ya navçeyê bandoreke bi awayekî berfireh heye li ser rewşa jinê, çimkî tu zagon tune ne ku mafêن jinê bi wê bidin nasîn û wan biparêzin, herwiha destûreke serbixwe nehatîye afirandin ji bo paras-tina jinê di civaka Sûrî de, ev yek û ya din jî ku layanêni siyasî yên Kurdî li Rojava mafê jinê bi dest ne xistine, eger em vejerin li dîroka wan em ê bibînin ku mafê jinê li ba wan wenda ye, ji ber rewşa xirab a Sûryê xwediyêni biryarê di van hêzan de aniha bi enterîkan li jinan digerin ji bo jinê wek madeyke dîkorî li nik xwe deynin, û ji axaftina fêlesûf ``Karl Markis`` derbarê jinê (ger we xwest win asteya pêşketina civakekê nasbikin li rewşa jinê binerin) diyar dibe xwestina van xwediyêni biryarê ci ye, û di warê pêkanînê de em ê dîsa bibînin ku mafê jinê wenda ye, çimkî li gorî nerîna wan ku wekheviyê navbera jin û mîr çêdikin, lê ev tête wateya ku jin dibe wek mîr û ev hevok ji gelek xelkan bi rengekî şâş hatîye famkirin, ji ber ku di vê gotinê de jinbûna jinê namîne û ew bi tenê dibe wek mîr, wek nemûne dema ku xortek xwe bixemilîne û jê re bêjin tu wek jina ye, lê gotina wekheviya jin û mîr ew e ya ku pêwîst e em bikarbînin di axaftinêni xwe de û di jiyanâ xwe de ya rojane..



gelek dengê mîranî dibêjin : ``mafê jinê gihiştiye wê``, lê em herin paş van gerefêtan û ev forma şaristanî û mebesta min ne hin kes bi eynê xwe ne û rêzgirtin ji xwediyêni gerefêtan re, ji bili ew gerefêtêni ku bi derew û mal xerabiyê ve tê hûnandin!!

dema yên xwediyêni biryarê bi du riwan bin û avahiyekê kesayetî didamezirînin ser xirabiya jinekê û malekê û civakekê tiştê dihêle ku mirov bitengije jî ku yên hawîrdora wî jê re li çepka didin!!

û wisa nexweşiyêni sykoloji di civakê de çêdibin û ev me davêje xala dewletên cîhanêni yên sêyemîn ...

Leyse..., mafê jina Kurd li Rojava bi awayekî

**Xunav Kano**



## Berf li Qamişloyê ...

Xelkên Qamişloyê li hêviya barandina berfê bûn û bitaybetî jî zarokên wê ji ber ku rewşa berfê mirov dilşad dike bi rengê xwe yê sipî tevî leystokên xweş di dema ku ew li ser xakê kom dibe û xelk bi destan dicivînin û davêjin hev, an jî peykeran bi wê çêdikin. Ji bili ku sudeya berfê ji bo çandiniyê û pirbûna avê li bajêr, weku tête gotinşala ku berf dibare, sala xêrê ye).

Lê mixabin gelek hêvi ne weku xelik an jî zarok dixwestin hatinji ber ku berf bi awayeke xurt û dijwar bariya, û ziyanek mezin li bajêr bitevahî kir. bi qutbirîna kehrebeyê û kembûna mazotê serma bû rewşa gelek ji malên bajêr, û wisa jî ziyanê digihîne tenduristiya xelkan û bitaybetî jî zarok. û herwiha jî bi qutbirîna kehrebeyê re av jî hate qutkirin û êdî ew jî bû piris-girêgeke mezin bêhtir ji dû rojan gelek mal bê av mabûn û metirsiyeke mezin li ba xelkê çêbibû.

Berf ziyanin din jî li bajêr kiribû, herwiha kombûna berfê û giranbûna wê gelek ji sêwanen dikanan dane erdê û gelek dar û şitlên ku xelkê çandibûn jî şikand.

Bavê Elî wiha axift li ser vê rewşê:

Me hêvi dikir ku berf bi xêr û xweşiyê bi ser me de werê, lê mixabin ku ziyan bi barandina wê re hat, min gelek dar li hewşa xwe



çandibû û ev demeke dirêj e ku min ew weke zarokên xwe xwedî dikir, lê berfa giran a bariya hin ji wan daran şikandibû û ez dara Leymûnê ya hate şikandin weke mirovekî tucarî jibîr nakim.

Ehmed Bavê dilşêr xwedanê dikanekê ye wisa ji Welat re axift:

Ziyanek diravî mezin li min bibû, sêwana dikana min şikest û hin ji firaxin din jî xirabibûn, lê bila bibin sedqa serê feqîra, û em ji Xwedanê xwe yê dilovan herdem bi spas û aferîn in. û ci ji ba Xwedan be ser seran û ser çavan.

Hêja gotinê ku bajarekî weke Qamişloyê dibe ku haziriyên wê hebin ji pêşwaziya berfê bike, û bihêle ku ew bibe diyardeyeke xweş li rex milet û ne bibe xirabî û alozî.

Îmad Talatî



## Komeleya Amûdê ya xêrxwaziyê



Bîrokeya avakirina vê komeleyê hate pêşniyar kirin di rûniştinekê de .ku tê de100kes ji bajêr li hev civiyabûn.di22ê sibatê sala 2012 an de .paşve di rûniştineke din de.di meha nîsanê sala2012 an de36 kes hatin helbijartin wek damezrêner ji komelê re. paşve 11 kesên din ji faktêrên civakî.navdarên bajar.rewşenbîr.û abûrnasan. hatin helbijardin wek encumeneke rêveberyê ji komelê re .

Û di 16ê nîsanî 2012an de Komela Amûdê a Xêrxwazî deryê xwe li ber xêzanên hejar vekir.

Kesên ku di vê komelê de kar dikan ji endamên encumena rêvebiryê ne.û ew jî jimareyekin

Ji pijîşk.endezyar.mamoste.parêzer.û faktêrên civakî û abûrî ne. û kar têde xwebexşane ye. û bê berambere.

Komel alîkaryê dighîne kesên hejar.sêwî.û xwedî pêdivyên taybet.herweha bi alîkaryênduristî jî radibe. bi riya dermanx-aneyekê taybet bi komelê.û alîkarya jimareyek ji xwendekarêñ zanîngeha jî dike.

Çalakyên komela Amûdê a xêrxwazî di sala rabhûrî de evin:

-di meha gulanê de 13350lîreyên Sûrî li ser 50 xêzanên hejar hatin dabeş kirin.

\_dimeha tîrmehê de ku yekemîn rojêne emezanê bûn kelûpelên xorakî bi nirxê 32500 lîreyên Sûrî.herweha 10000 lire.û hin cilêñ zaroka liser xêzanên hejar di bajar de hatin dabeş kirin.

\_di 15 ê meha remezan de 27500 lire li ser 115 xêzanên ku ji parêzgehêñ din yê Sûryê penaber bûne hatin dabeş kirin.

Li ser çawaniya bi destxistina pişgirya darayî ji komelê re me ji endamekî wê e pirsî.û ji mere got:

Bêhtir ji 600 kesî di komelê de endamin.û her yek ji wan bi

kêmanî mehane 100 lîreya sûrî dide komelê.herweha hin bazirganêñ bajar jî alîkaryê bi mere dikan .û hin revendêñ ajarê Amûdê li derive jî alîkaryê ji mere dişînîñ. û rêexistinêñ ku alîkaryê bi mere dikan evin:

1-rêexistina(P.A.O) a nerwêcî  
2-hevbenda kurdî ji bohawrhatin û geşepêdanê(AVAN)

3-komela(Albir we elteqwa)

4-despêşxiriya ji bo Sûryêke nû

Herweha liser çawanya belavkirna alîkariyan li ser xêzanan .heman endamê komelê weha bersiva me da:

Me bajar dabeş kirye li ser 4 beşan li ser her beşekî 4 enda berpirsyarin teví endamekî ji encumena rêvebiryê.her hinek ji wan li beşê xwe digerin .û navê xêzann hejar tomar dikan.herweha em van xêzanan jî li ser 4 pileyan dabeş dikan .û her yek li gor pêdivyên wê em elîkarya wê dikan. di pileya yekem de kesên sêwî,jinbî.û xwedî pêdivyên taybet têñ.

Lê wek hemu karêñ din.herweha karê xêrxwazyê jî rastî aztengyan tê.û li gor ku endamkî komelê jimere go. aztengyên k li ber karêñ wan di westin evin:

1-girtina dergehêñ sînorî.û alozyên peywendiyê bi dewletên dirawse re.

2-buhabûna nirxê kelûpelan. û têkçûna rewşa abûrî.

3-nebûna wesayitên veguheztinê yêñ taybet bi komelê.û buhabûna nirxêñ veguheztinê.

Lê tev hemu van aztengyan .Komela Amûdê a Xêrxwazî .şiya ku alîkaryeke baş bighîne hejarên vî bajarı. û destê xêrxwazyê ji kesên pêwîstiya wan bi alîkaryê heye.dirêj kir.û di dilê sêwî .û bêkesan de hêvya jiyanekê xweşter çand.

Mihemed Alûcî



## Pandora firoştin dîzl û benzîna xav li benzînxana



Di sed sala bîst û yekan de sûtemenî dibe ji pêdiviyên rojane, ew jî dibe wek nan û avê, weku tête zanîn bêhtirî dû salan li ser dorpêçkirina abûrî li herêmên Kurdî desthilatdarî nema sûtemenî derbasdike parêzgeha Hesek. û hêja ye gotinê ku petrola xav hemî ji bîrên petrolê yê li seranserî herêmên Kurdî payda dîbin tête kişandin û veguhistin ta dîghê misfata Baniyas û Himsê.

Lê di vê dema dawî de misfateke petrolê li herêma Qeraçokê hate avakirin û bi berhemên xwe dikarîbû rûbirwê dorpêçkirinê bisekinê û pêdvîyên herêmê ji kêmaniya sût-meniyê bi temamî peyda bike.

Lê tevî wê jî û ji alîyeke din ve gelek bandorêneyînî yêngî dîzil û benzînê yêngî têtin frotin li benzînxaneyan û li

ser rêyan li siyareyan heye û di encama ne baqîjbûna dîzilê û benzînêde bi sadan ji wan sekinîne û xerabûne, û ev yek barekî giran danî li ser milê xwediyyên siyareyan.

Samî Enter mîkanîsiyan e ji Gerkê Legê ye sedema xirabûna otombîlan dide xuyankirin û dibêje:

Naveroka benzîn û dîzilê yen tête frotin li herêmê madeya Kibrît û petrola xav di nav de heye ev sedema sereke ye ya seknandina otombîlan.

Herwiha Rewan Hisêñ ajoker e, pirisgirêka ne baqîjbûna dîzilê şîrove dike:

karê me bûye çaksazkirina xerabûna motorê otombîlê û di berdewamîya axiftina xwe de got: di mihê de em sisê ta çar caran motor divekin û em baqij dîkin ji qirêjê ya ku ji benzîna gemar tê.

Herwiha banga milet ku çareserî ji van pirisgirêkan re bête dîtin û hêvî û daxwez ew in ku kesin bispor di misfat Qiraçokê de kar bikin.

GULAL LIYANÎ



## Rewşa xwendekaran li Zanîngeha Ferat



Piştî rewşa şer û pevcûnan di navbera komên çete û rêtîmê de li sûryê û rewşa xirab ya welat bîtevahî bandora xwe bi awayekî berfireh dike ser xelkên wê, herwiha rewşa xwendin û zanînê lawaz bûye, li gorî rewşa welêt, gelek ji zanîngehêna sûrya ziyanekê gewd gihiştiye wan li parêzgehêna Hims, Heleb, Dêra zorê ... hwd

Zanîngeha Ferat li herêma kurdî heye û ev besên wê ne:endazeyara çandinê-riyadiyat-bijîşkiya diranan-zanîn-wêjeya erebî-wêjeya frensî-perwerdeya zarokan-zanîna şûnwaran-mamostayê polê-endazeyara şaristanî-abûrî û yasayî

Diyar e ku bajareke wiha biçûk nikare evqas xwendevanan bihewîne û gelek xwendekar yên li zanîngehêna din dixwendin, neçar in ku li Hesekê xwendina xwe berdewam bikin û gelek jî penaber bûne li dewletan û bê xwendin mane, herwiha gelek besên xwendinê li Hesekê tune ne wek tiba mirovan û wêjeya ingilîzî xwendevanê van beşan neçar dibin ku ezmûnên xwe li Hesekê pêşkêş bikin bê xwendin û pirtûk, herwiha holên xwendinê kêm in û jimara diktoran pir kêm e diktor

``ferîd saadûn`` cîgir ê serokê zanîngeha wêjeyan ê karêne rêveberî ji welat re got:

25 hezar xwendekar li Hesekê îsal hene û astengiyêna xwendinê pir in, holên xwendinê tune ne û girûpa fêrkirinê tune ye û taqîgeh û tiknolocî û rûpel û çapxane bi tevahî tune ne, lê hêja ye gotinê ku îsal hin alîkarî bi xwendekaran re hebûn wek xwendekarêna zanîngehêna din karin ezmûnên xwe li Hesekê pêşkêş bikin û herdemîya xelekên lêkolînê herwiha tune bûne hilbirînê û serkeftina ser 8 madan.

``Zahid`` xwendekareke ji bajarê Qamişlo ye û sala çaremîn wêjeya erebî dixwîne û cûdayetîk pir dît di xwendinê de di navbera zanîngeha tişrîn û fûrat de çimkî li tişrîn ji her madek re 3ê diktor hebûn lê li Hesek ê her madek mamosteyek bi tenê ye û piroblêma derengiya derketina encamên ezmûnan li Hesekê..

Zehmetiyêna xwendin û zanînê pir in ji ber rewşa jiyanê li herêma cezîrê, bi hêviya çareserbûna van astengiyen ji bo xwendineke serkeftî û wek rewşenbîr ``ciger xwîn`` dibêje:(xwendin nebe kes naçe pêş)

Xunav Kano



## Serê Kaniyê şarê biratiyê



Serê kaniyê tê naskirin bi geşbûna pêkhatiyên xwe ji mêt ve û ta vê gave , bi hevbeşiya hemû pêkhatiyan wek Kurd , Ereb , Çîçan , Suryan û Aşûrî , ev tişt hişt ku navê (Sûrya biçük) li Serê Kaniyê were kirin û bi wî tête naskirin .

Têkiliyên cêwaz di navbera vî miletî de pir ciwan û balkêş in, û ev bû ya ku parast hevjiyana aştî hêmenî li nav û derdora vî bajarî .

Tev lî daxwaz û hewlên rîjîma qirêj ku van pêkhatiyan ji hev bixe û di nava wan de alozî û bedkariyê biçîne bêtirî carekê bi taybet dema serhildana kurdî (2004) de ku dixwest şerekî dijwar di nav bera kurd û erebande çêbike .

Lê ev şar bi xelkê xwe çesiband û tekez kirin li ser parastina pêwendiyên dîrokî yên wan dicivînin .

Û ev berxwedana hevbeş berdewame tevî wan buyerên derbasbûyî û ta vê rojê jî .

Bi vîna hevjiyanî û hevbeşî ya ku di navbera wan de hişt ku sembol ew be: jiyanek aştiyane .

Û hev dîtinên (welat) bi hijmareke ji kesayetiyên civakî û rewşenbîrî û ji hemû pêkhatiyan, çesibandin li ser dîmanê aştiyê û biratiyê , tev lî hemû astengî û aloziyan , û di hemû deman de .

Van kesayetiyen bangekê dişînin ji hemû tezûyên ramyarî û dezgehan re bo ku alîkar û beşdar bin û parastin û çaksaz bin ji vê tabloya ciwan ya ku Serê Kaniyê bi wê navdar e û pêdi-vîbûna berdewamiya ev rewanê hevjin û hevbeş bo hemû pêkhatiyan

Xalid şêxo



## Çandinî li Dirbêsiyê

Bajarê Dirbêsiyê yê ku li ser sînorê Tirkîyê cih digire, û dûr e ji bajarê Hesekê nêzî 30 k.m, pir navdar e bi çandiniya xwe ya ku dibe jêdera sereke ji jiyana piraniya xelkên wî.

Herwiha genim û pembo herdu madeyên sereke ne di demsalên çandiniyê de li gundewarên bajêr, tevî hin madeyên din wek: nîsk,ceh,kemûn...hwd.

Û şêwezen ku bi wê çandinî têtin avdan hêj şêwazin siruştî ne,tevî ku rîbazin nûjen hene li hin cihan xelk ewan bikar dihênin.

birêz Mihemed Hac Slim ji me re axift û got ku di vî mûsimî de ti alîkarî negihane destêwan ta anîha , û nejî mazot û bizir

baş peyda dibin da çandinî bi rewşeke pak şîn bibe,û ev jî dibe metirsîyeke mezin ji wan re.

Ehmed El Hido wiha axift: gelek astengî li pêşîya me hene,û em di rewşeke dijwar de derbas dibin di pêwariya madeyên sereke yên çandiniyê. Û eger mûsim îsal jî ne baş be ,ew ê dê ziyanike mezin li şeneyên bajêr û tevahiya herêmê bibe.


Her weku tête zanîn bi destpêka sala nû re sermayeke dijwar bi ser bajarê dirbêsiyê de hatiye û di kêmbûna baranê de ew ê dê metirsîyên milet zêdetir bibin û dê gelek ji wan dûr bikevin ji çandiniyê û li jêderekê din bigerin ji rozîna xwe û zarokên xwe re.

Sadûn El Sîno





## Zelalmendî



Zelalmendî termekê nûjen e tê bi karanîn bo eşkerekirina kirayr û siyasetên çi hikûmetê . Zelalmendî dide xuyakirin ku mafê gel di naskirina siyaseta giştî û rêvebiriya dewletê de heye , bi mebesta ku rê li ber kiryar û siyasetên nediyar (di bin maseyê de) bigir e . Jiwilo Zelalmendî tê naskirin ku ew mekanîzmeke bo eşkerekirina hemû çalakiyên pilansazî û bicîkirinê yên hikûmetê ye . Têkiliyeke xurt di navbera Zelalmendiyê (wek mafekî ji mafén mirovan) û Hevwelatî , Demokrasî û Gendeliyê de heye .

### - Zelalmendî û Hevwelatî :

Girêdanek xurt di navbera Zelalmendî û mafê mirovan de heye , ji mafê çi hevwelatiyekî ye ku hemû agahiyên girêdayî jiyan û berjewendiyên xwe nas bike jiber madeya : (19) an ji beyannameya cîhanê ya mafên mirovan dibêje : ku ji mafê her kesî ye azad be di nêrîn û derbirînên xwe de ji azadiya hilgirtina nêrînan .

### - Zelalmendî û Demokrasî :

Zelalmendî yek ji hîmîn Demokrasiyê ye û wê pêşve dibe û bingeh û rewşa wê xurt dike . ger Zelalmendî ne likar be wê bikaranîna Demokrasiyê kêm be û rê li ber xurtkirina Diktatorî û Tundrewetiyê derheqê hevwelatiyan de ve dike.

### - Zelalmendî û Lêpirsîn :

Zelalmendî derfetê dide hevwelatiyan bo ku Lêpirsînê li pergal û siyaseta hikûmet , rêxistin , rêvebirî yê bike .

### Zelalmendî û Gendelî :

Gendelî tê naskirin ku nexweşîyeke pîs e ,welatan jihev dix e û paş ve dibe , û bi awayekî lezgîn di laşê civakê de belav dib e , jiwilo têkiliyeke berovajyane di navbera Zelalmendî û Gendeliyê de heye , nedîyarbûna Zelalmendiyê rewşê ji çêbûna Gendeliyê re amede dik e , îca çiqas Gendelî zêde bibe zelalmendî kêm dibe .

### Armancê Zelalmendiyê :

- Xrûsipîkirina welat liser asta herêmê û navdewletî di warê çaksazî û dijberiya gendeliyê de .
- xurtkirina nirxên li dijî Gendeliyê , wek Rastgotin û Destpaqijiyyê .

- geşkirina çanda dijberiya gendeliyê û nebikaranîna qenc ji deshilatdariyê re di civakê de .

### kiryarê Zelalmendiyê :

- Zelalmendî bi rêya van xalan de pêk tê:
- jevcudakirina di navbera hersî deselatiyan de ( Yasayê , Bicîanînê , Dadweriyê ) .
- avabûna hevbeşîyeke rastîn di navbera hikûmet û hevwelatiyan de bi nûneritiya saziyên civaka sivil .
- deselatdariya yasayê û deranîna yasayên ku bi hevwelatî û saziyan re alîkar be bo eşkerekirina Gendeliyê .
- Demokrasî ya ku derfetan peyda dike bo bikaranîna Zelalmendiyê û rê liber lêpirsînê ve dik e .
- Hebûna pergalin çavdêriyê bo xurtkirina Zelalmendiyê û dijberiya Gendeliyê .

Nedîyarbûna zelalmendiyê bandoreke neyeñî li pêşveçûna civakê û rewşa welat dike , nemaze di warê aborî û belavkirina dahatiyên aborî yên welat de . di cîhanê de hin rêxistin hene bo xurtkirina Zelalmendiyê û dijberiya Gendeliyê û ew jî ev in :

### - Rêxistina Zelalmendiyê ya cîhanê :


Di sala 1993 yan de hatiye damezirandin , û razgiriya wê li bajarê Berlîna Elmanya ye û ew ji rêxistinê civaka sivil û pêşeng e di warê dijberiya Gendeliyê de , şaxên wê li 90 welatî hene , her sal ev rêxistin raporeke salane der tîne welatan li gorî Gendeliyê berhev dike .

### - Banka Navdewletî :

Di sala 1944 an de hatiye damezirandin , û baregeha wênî sereke li Waşinton a Emerîka ye . bêtirî sed bîroyên wê li seranserî dunyayê hene .

Li welitekî berwêran mîna sûryayê . nasandina têgehin mîna Zelalmendiyê bo xurtkirina demokrasiyê û belavkirina hişyariyê gerek û girîng e . jiber ku gelê vî welatî bi sala ye ku ji maf û agahdariyê bêpar e , ôro ji di rewşekî cuda de dijî , veguheztin e , pêdivahiya ci sazî , rêxistin û şêwazên ku nû ava bûn e bi van têgehan heye bo ku mirovîn vî welatî li erk û mafê wan hişyar bik e .

Zuhrab Qado



## Karê zanan

**Beyar Robarî**


Kurdo raweste li ser pêyan  
 Gavan bavêje wek zanan  
 Bi hesab û bipîvan  
 Ev fersenda tim netê ber destan  
 Rewşa Rojavayê Kurdistanê, nazik û bargiran  
 Ji me tê xwastin, yekîtiya helwest û siyasetan  
 Avakirina sazî û hêzên pêşmergan  
 Û hildana yek al û bêlîkirina sînoran

\* \* \*

Kurdo avake Rojava  
 Bilez û bez me divên:  
 Çek, pêşmerge, çapemenî û peran  
 Karê xwe bike wek zane û şêran  
 Neyar li pêş û paş me ne  
 Çavên wan li gavên me ne  
 Bawerî meke bi Tirk û Faris û Ereban  
 Erebêni li ser hukim û opozisyûna roja hîro  
 Jibo Kurdan wekhevin  
 Dev qerêj û bêbawerîn  
 Soz û peymanêwan, tevî derewin  
 Ew ji berê de, xwedî xapîn û falin  
 Hîro û sibe, ew ji me re neyarîn  
 Jibo wan Kurd nehevparin  
 Tenê bes, em xizmetkarin!  
 Kurdê zane, ev dîrok û bûyer ji bîrê narin  
 Kurdîro wek duhu, bê dost û palin.

## Sibe ...

**Şêro Dalînî**



Min digot :

Sibe .. ez ê gazinê xwe bi welitekî re parve bikim..

Sibe ez ê têra xweziyê xwe  
 Yêbêguneh..li çavêne we bibim mîvan..  
 Ez ê hewil bidim ku xwe şîretên pîrejinan  
 û bi keserên kûr ên kalan re hilmeke hênik  
 Diyarî xilmaşıya we bikim..

Sibe..ez ê nema kelegermiya xwe riwê xwe de binixumînim

Nema hestêna qaçax di bin tabloyê sar de  
 Ji ronahiya gavên çûyîn re veşêrim..

Sibe...ez ê ji her xewekê re  
 Helbestekî re vivîn bikim  
 û bi her mizeke çıxareyê re di gola çavêne  
 We de kûrtir herim..  
 û welitekî ji xwe re bistînim...



## Ji gewherên Mem û Zînê : Xaniyê Mêjûnas

Seydayê Xanî di Mem û Zîna xwe de her cure zanîna xwe daye nîşandan. Ji tesewûfê bigire heta felsefeyê, heta civaknasiyê û muzîkê, stîrnasî û zimanziyê, û heta bigihê mêtû-nasiyê.

Wî ji her zanînê behrewerî biriye. Di zimanê erebî de desthilatdariyeke pir mezin daye xuyakirin. Peyvîn erebî yên ku tenê di ferhengan de hene û ereban bi xwe êdî ew ji bîr kiribûn, bi karanîne. Mînak peyva Yûh (H wek H'ya di serê gotina Heyran de ye) ji bo rojê bi kar tîne. Lî mijara me ya îro ne zimanziya Xanî ye, belê mêtûnasîna wî ye.

De ka em binêrin heta kîjan radeyê Şêxê me mêtûya kurdan dipa û di kitaba kurdan de hin beş ji vê mêtûya ku hemî xwînrêjî û şer bû anîne ziman!

Dema ku Beko yê ewan tê ba mîr û paşgoyîya Tacdîn dike, li xweşa mîr nayê. Radibe piştgiriya Tacdîn û Memo dike. Wisa xanî çîrokê dibêje:

Mîr go: Qe didim eya bed exter Tacdîn û Memê bi textê Qeyser?

Roja we ku bûye ceng û perxaş Tacdîn û Memê du sed Qizilbaş Bilcumle bi zîrh û zend û binber Înan ji me ra bi şîr û şesper

Bê guman Xanî ne ji xwe re qafiye li hev anîne, lê di van malikan de behsa şerekî di navbera leşkerên Cizîrê û leşkerên sefewiyan (Qizilbaşan) de dike. Xanî li ser zimanê mîr pesnê Tacdîn û Memê wiha dide:

Roja şer û cengê, Tacdîn û Memê du sed serbazên qizilbaşan dîl girtin û anîne Cizîrê. Hemû tev li çek û şûr û zirx û gurzên wan.

Ji ber ku Mem û Zîn ne her kitêb e diva bû ez li jêderên dîrokî vegekim û binêrim ka ev ci şer bû di navbera kurdan û eceman de qewimî bû.

Di Şerefnameyê de çavêن min bi şerê di



navbera Artêşa Şah Îsmeîlê sefewî û cengawerên Botanê di dema mîr Şeref de ketin. Şerefkan dibêje ku dema şah Îsmeîl hate ser textê Iranê, leşkerekî giran şande Cizîrê da ku dagir bike lê mîr Şerefê kurd li ber xwe da û çend caran ew leşker şikand heta di şerekî de hezar û heftsed qizilbaş kuştin û gelek ji wan dîl kirin. Dîsa Şah Îsmeîl leşkerek bi serokatiya mîrmîranê Diyarbekirê Mihemed İstaclû û birayê wî Qerexan re şand e Cizîra kurdan lê dîsa jî zora mîr Şeref nebirin û şikestî vegeryan. Cara sîyem şah leşkerekî bijarte ji pasdaranê şahanî ji hêla Hemedanê bi serokatiya Yekan begê Teklû kişande ber bi Cizîrê ve. Lî vê carê jî artêşa qizilbaşan şikesteke mezin xwarin û revî, revî berê xwe dane welatê Iranê û êdî nema qizilbaşan bela xwe di kurdên Cizîrê dan!

Ev e giraniya Mem û Zînê.

Ne tenê çîrokeke xemgîn a du evîndaran e!!

Ev e cudatiya Mem û Zînê ji berhemên din.


Ev in gewherên şêxê kurdayıtyê Ehmedê Xanî.

Heta yeke dîn....

jan dost



## fêrbûna ziman



- Ji bo shagirtên nû fêrî xwendinê dibin

Dem. Dema te (wexta te). Dema te bi xêr be.  
Merheba.

Ez tu. ew = Em. Em dost in. Em heval in.

Fatê. Ferat. Fatê li kêleka çemê Ferat e.

Ga. Gavan. Ga hebûn, gavan hebûn, li  
gundêñ Kurdistanê.

Hans. Hans navekî Almanî ye. Hans li bajarê  
Hambûrg e.

Idlib. Idlib bajarekî Sûrî ye. Li rojavayê  
Helebê ye.

Îsot. Ma bêyî îsot dibe? Îsot jiyan e. keko,  
jiyan!

Mij. Baranê vekir, mij dest pê kir. Jiyan e,  
baran jî heye, mij jî heye.

Ka kurê te Kamo? Çû Kîkan! Kîkan gundekî li  
rojhilatê Kobaniyê ye.

Şahîn Soreklî

---

Çend navêñ kurdî

Nazan – Perîn – Serav – Kajîn – Azad  
Kavîn – Şadan – Lavîn - Jêhat - Dilîn



## Pinpinîka zêrîn

Pitşî ku Sihirbazê bajêr got ku Pinpinîkeke zêrîn di  
bajêr de heye. Û yê ku wê Pinpinîkê werîne dê ew yek  
bibe şah, xelkê bajêr bi; zarok – mezin – pîremêr – pîrejin  
tev çûn ta ku li Pinpinîkê bigerin.

Her kesekî ji bajêr pinpinîkek anîn, baskêñ pinpinîkan  
di destê wan de dişkestin .. Û jiyana pinpinîkên bajêr  
kete xeterê de . ji ber vê yekê Sihirbazê bajêr bi tirs bû  
û got ku Pinpinîka zêrîn çîrîşkan dide bi rengekî zer .di  
dema rojê de ew çîrîşkên pinpinîkê bêtir têne dîtin. Û  
nabe ku hûn pinpinîkek şaş bînin.. Sihirbaz pinpinîkên  
wan xistin odeyekê de, ew derman kirin. Û gul û rîhan ji  
wan re anîn ta ku şifa bûn û ew berdan.


Zarokekî ji bajêr ku navê wî Eyan e pinpinîka zêrîn dît  
û bi dîtina wê pirşa bû ,lê pinpinîkê şert û mercen xwe  
ji Eyan re got .ku ji te tê xwestin ku tu wekheviyê  
bike tu xerabiyê ji bajêr derxe. Û tu alîkariya belenga-  
zan bike ... Eyan jî ev merc pesend kirin.. bi lez gote  
bavê xwe : Yabo min pinpinîka zêrîn dît ... Û bavê wî ji  
kêfa xeberê re bang dikir, dikeniya û Eyan jî bi kêfa  
bavê xwe re şâ bû ... Sihirbazê bajêr civînek çê kir da  
ku nas bike tu kesî ew pinpinîk dîtiye an na .. Eyan got:  
belê Sihirbazê bajêr min pinpinîka zêrîn dît û ew bi min  
re ye aniha.. ji tîrsa re şahê Kevin bang kir û got : çi  
daxwazêñ we hebin ez ê pêk bînim lê bela ez şah  
bibînim.

Pinpinîkê gote Eyan vê yeke nepejirîne û ji bo bicûk-  
bûna temenê te bela bavê te bibe şah .. Eyan bi gotina  
pinpinîkê kir û gote şah : eger te wekhevi kiribe û dizî  
nekiribe, dê bavê min şah be û tu cîgirê wî be ... şahê  
kevin bi vê yekê dilxwêş bû û ma cîgirê bavê Eyan.  
Eyan mezin bû, û bû şahê bajêr.... Zarokêñ pinpinîka  
zêrîn jî çêbûn . û bajêr bi wan hate dagirtin û wekhevi  
her hebû li bajêr.

Helbest Yûsiv



## مشكلة الهروب من المنزل عند الطفل



**أولاً : التعريف بالمشكلة :** الهروب من المنزل هو مغادرة الطفل بيت الأسرة عدة ساعات في اليوم الواحد أو خلال الأسبوع و تسكعه في الشوارع أو الملاعب أو عند رفاقه و أقاربه و ذلك دون إعلام أبويه بذلك أو إعلامهما إعلاماً كاذباً . و هذه الظاهرة تحدث عند الأطفال بنسبة قليلة قبل سن السادسة و بنسبة أكبر في مرحلة المراهقة و قد تستمر إلى مرحلة النضج .

استمرار الهروب من المنزل و تكرارها يترك آثار سلبية في شخصية الطفل (( كقره المنزل و الأسرة و التخوف من الأشخاص المقربين كالآلام و الآب و عدم الثقة بهم )) .

### ثانياً : أسباب الهروب من المنزل :

- 3 - تجنب المعاملة التي تسبب نفور الطفل من أبويه ، فالشجار المستمر أو المتكرر بين الأبوين أو قسوتهما المفرطة و معاقبتهم للطفل على ارتكابه أفعالاً لا يعرف أنها خاطئة ولا يعرف خطورتها .
- 4 - اصطحاب الطفل في جولات خارج المنزل كالحدائق و المتنزهات .
- 5 - تجنب الوالدين مبدأ المقارنة و المعايرة .
- 6 - حين يحدث الهروب من يتكرر ينبغي البحث عن أسباب حدوثه في أجواء المنزل و الأسرة من جهة و في شخصية الطفل من جهة أخرى .

**وأخيراً** نرة بأن الأسرة هي الوسط الملائم لإقامة جو من الألفة و الود يشعر فيه الأفراد بالحب و تنمو بينهم مشاعر المودة و عواطف الحب و الحرمة ، و ينقل إليهم العادات و قواعد السلوك والأدب .

كمراة أيو

- 1 - شعور الطفل بالتعاسة و الضيق و التوت حينما يكون في المنزل بسبب الأجواء المنزلية المتوترة المزعجة و القيود الصارمة على حريته في الحركة و اللعب .

- 2 - اذا ارتكب الطفل خطأ يعلم أن له عقاباً شديداً ، فيلجأ إلى الهروب من المنزل إلى أحد الأقارب كي يحميه من غضب الوالدين و سوء معاملتهم له .

- 3 - الغضب من سوء المعاملة أو اعتقاد الطفل أنه مظلوم و في هذه الحالة يهدى الطفل إلى الانتقام من الأبوين مع الأمل أن يشعروا بقيمته إذا غاب عنهم .


- 4 - غياب أحد الوالدين و عشور الطفل بالإهمال و الوحدة و يحدث في حالات ذهاب جميع أفراد الأسرة للعمل أو لشؤونهم الخاصة و ترك الطفل وحيداً .

- 5 - الأمل في عمل أو ربح الذي يدفع العديد من الأبناء إلى ترك منازلهم للبحث عن الأهداف و قد يكون ذلك دون علم الأبوين أو رضاهم .

### ثالثاً : سبل الوقاية من الهروب و معالجته :

- 1 - توفير الجو الأسري المرير للطفل المطمئن له الذي يشعره باهتمام الأبوين به و مراعاة حاجاته .

- 2 - إتاحة الفرصلتعرف الطفل على أطفال من عمره و تمكينه من دعوتهم إلى المنزل و اللعب معهم و مشاركته في المناسبات السعيدة كعيد ميلاده .



اما حاجة تأمين سيارة، أو تأمين وقودها هو أمر غير متوافر عند نسبة عالية من المهاجرين.

بهذا المعنى، إن مدن بلدنا التي تفرغ الآن، تقدم دفعات متتالية من شبابنا وشبابنا إلى مجاهيل أوروبا، مع أن الطريق إلى أوروبا ليس معهداً بالورود، لكن ومع أن من يهاجر الآن له أسبابه الكثيرة، لكن لابد على العالم جمِيعاً من وضع الحد لمثل هذه الأسباب التي تحول مدننا إلى مجرد أطلال، وأهلها مجرد مهاجرين غرباء يكون أبناؤهم مشاريع للمعاناة، بل علينا أن نفكر بتوثيق العلاقة بين المهاجرين ووطنهم، وعلى الدول والمنظمات الإنسانية التي تشرع لمثل هذه الهجرة الآن للسوريين، أن تعمل على عدة جبهات: الأولى إلغاء الأسباب الداعية للهجرة الرهيبة، وثانية خلق ظروف العودة الآمنة إلى الوطن، وكل هذا مسؤولية العالم كله، إن كان له ضمير إنساني بعد كل الذي يجري للسوريين أمام عيون الجميع.

## سبعين في العروض الفارو

هلبست يوسف

# مسلسل الهجرة

## معالجة الألم بالألم :

لاشك أن موجة الهجرة إلى أوروبا، وأبعض دول الخليج قد مضى عليها وقت طويـل، وهناك أسرسـورية عانت الأمرين من جراء مثل هذا الأمر الخطير اجتماعياً، إذ أن أسرـاً كثيرة قد اضطرت للهجرة خارج وطنـها، وإذا كان جـيل الآباء عادةً يستطـع أن يحافظ على بعض خصوصـيـته، وأهمـها اللغة، فإنـ الجـيل الثاني الذي يأتي بعـده سيفـقد الكـثير من مـقومـاتـ هذهـ الخـصـوصـيـةـ، وهوـ يـكونـ الـحلـقةـ الـوـسيـطـةـ بـأـحـسـنـ الـأـحوالـ،ـ بينـ جـيلـ الآـبـاءـ وـالـأـحـفادـ،ـ لأنـ الـأـحـفادـ سـوفـ يـنـتـمـونـ إـلـىـ مجـتمـعـ آـخـرـ مـفـاـيـرـ،ـ إنـ لمـ يـكـنـ جـيلـ آـبـائـهـ هـوـ الـذـيـ يـفـقـدـ هـذـهـ الخـصـوصـيـةـ.

والهـجـرـةـ الـتيـ نـشـطـتـ مـذـ ثـمـانـيـاتـ الـقـرـنـ الـعـاصـيـ بشـكـلـ مـلـحوـظـ،ـ وـارـتـفـعـتـ نـسـبـةـ الـمـهـاجـرـينـ بـشـكـلـ أـكـبـرـفـيـ مـرـحلةـ التـسـعـيـنـاتـ،ـ فـإـنـ هـذـهـ النـسـبـةـ اـرـتـفـعـتـ أـكـثـرـفـيـ الـعـقـدـ الـأـوـلـ مـنـ الـقـرـنـ الـحـالـيـ،ـ وـكـانـ لـذـكـ أـسـبـابـ كـثـيرـةـ مـنـهـاـ مـاـ يـتـعـلـقـ بـالـوـضـعـ السـيـاسـيـ،ـ وـمـنـهـاـ مـاـ يـتـعـلـقـ بـالـوـضـعـ الـاـقـتـصـاديـ،ـ لـأـنـ مـلـامـحـ تـجـوـيـعـ السـوـرـيـينـ بـدـأـتـ ظـهـرـ،ـ وـكـانـ هـنـاكـ مـنـ لـمـ يـسـتـطـعـ تـأـمـيـنـ لـقـمـةـ الـعـيـشـ وـتـدـرـيـسـ الـأـسـرـةـ،ـ مـعـ أـنـ التـدـرـيـسـ مـجـانـيـ،ـ وـلـكـنـ التـعـلـيمـ الجـامـعـيـ كـانـ يـتـنـطـلـبـ مـصـارـيفـ باـهـظـةـ مـنـ الـآـبـاءـ بـالـقـيـاسـ إـلـىـ مـرـدـوـدـهـمـ،ـ إـذـ كـانـ لـهـمـ مـرـدـدـ ثـابـتـ،ـ لـأـنـ الـبـحـوثـ الـتـيـ كـانـتـ تـجـريـ قـبـلـ سـنـوـاتـ عـلـىـ نـطـاقـ صـفـيـرـيـ عـدـدـ مـنـ الـمـدـنـ،ـ وـبـشـكـلـ عـشـوـائـيـ كـانـتـ تـبـيـنـ أـنـ نـسـبـةـ الـبـطـالـةـ مـتـفـشـيـةـ جـداـ،ـ وـكـانـ لـذـكـ تـأـثـيرـمـباـشـرـ عـلـىـ أـفـرـادـ الـأـسـرـةـ،ـ وـكـانـ الـحـلـ بـالـهـجـرـةـ هـوـ الـحـلـ الـذـيـ يـفـكـرـ بـهـ كـثـيرـونـ،ـ إـنـ كـانـ الـبـعـضـ لـمـ يـسـتـطـعـ حـتـىـ تـأـمـيـنـ أـسـبـابـ الـهـجـرـةـ نـتـيـجـةـ بـؤـسـ الـوـضـعـ الـاـقـتـصـاديـ.

والغرـبةـ عـلـىـ الرـغـبـةـ مـنـ أـنـهـاـ وـصـفـةـ سـدـرـيـةـ بـنـظـرـ الـبـعـضـ تـنـقـذـهـمـ وـأـسـرـهـمـ مـنـ الـفـاقـةـ،ـ إـلاـ أـنـ لـهـاـ تـأـثـيرـاتـ كـثـيرـةـ فـيـ نـفـوسـ الـمـغـتـرـيـنـ الـآـبـاءـ مـنـهـمـ وـالـأـبـنـاءـ،ـ بـحـيثـ لـاـ يـنـجـوـ مـنـهـاـ أـحـدـ،ـ هـنـاكـ عـالـمـ جـدـيدـ يـفـتـحـ الـمـغـتـرـبـ عـلـيـهـ عـيـونـهـ،ـ صـحـيـحـ أـنـ الـلـقـمـةـ قـدـ تـكـوـنـ مـؤـمـنةـ خـاصـةـ فـيـ الـمـهـاجـرـ الـأـورـيـةـ الـتـيـ تـعـاـمـلـ مـعـ الـمـهـاجـرـ لـأـسـبـابـ إـنـسـانـيـةـ،ـ بـتـقـدـيمـ الـلـواـزـمـ الـأـوـلـيـةـ لـهـمـ الـأـمـانــ الـرـغـيفــ الـطـبـابـةــ الـسـكـنـ،ـ وـهـيـ كـلـهـاـ مـفـقـودـةـ الـآنــ فـيـ بـلـدـنـاـ السـوـرـيـ،ـ وـخـاصـةـ الـأـمـانــ،ـ وـلـكـنـ هـنـاكـ ثـمـنـ يـدـفـعـهـ الـمـهـاجـرـ،ـ إـنـ ثـمـنـ كـبـيرـقـدـ لـاـ يـنـسـاهـ طـوـالـ حـيـاتـهـ،ـ إـذـ هـنـاكـ صـعـوبـاتـ كـثـيرـةـ تـعـرـضـ طـرـيقـهـ،ـ مـنـ هـذـهـ الصـعـوبـاتـ الـتـأـقـلـمـ مـعـ الـحـيـاةـ الـجـديـدةـ،ـ فـالـلـغـةـ غـرـبـيـةـ،ـ وـيـلـازـمـ لـتـعـلـمـهـاـ وـقـتـ


طـوـيـلـ،ـ خـاصـةـ بـالـنـسـبـةـ لـمـنـ كـانـ فـيـ الـمـراـحلـ الـمـتوـسـطـةـ وـالـثـانـيـةـ وـالـجـامـعـيـةـ،ـ كـمـاـ أـنـ الـكـثـيرـيـنـ مـنـ الـطـالـبـاتـ وـالـطـلـابـ الـذـيـنـ يـهـاجـرـونـ يـجـدـونـ مـوـانـعـ كـثـيرـةـ تـحـولـ دونـ مـوـاـصـلـةـ تـعـلـيمـهـمـ،ـ وـالـأـسـبـابـ عـدـيـدةـ،ـ كـمـاـ أـنـ هـنـاكـ كـثـيرـيـنـ أـخـذـوـاـ فـكـرـةـ وـرـدـيـةـ عـنـ الـحـيـاةـ الـأـورـيـةـ،ـ وـأـنـ أـعـرـفـ مـنـ لـاتـسـتـطـعـ الـمـعـونـةـ الـاجـتـمـاعـيـةـ الـمـقـدـمـةـ لـهـ أـنـ تـغـطـيـ جـزـءـاـ مـنـ نـفـقـاتـهـ،ـ وـقـدـ يـكـونـ تـأـمـيـنـ قـمـيـصـ جـدـيدـ يـتـطـلـبـ خـطـةـ شـهـرـيـةـ أـوـسـنـوـيـةـ،ـ وـهـوـيـطـبـقـ عـلـىـ غـيرـذـكـ،ـ كـمـاـ أـنـ زـيـارـةـ الـأـسـرـةـ لـعـائـلـةـ أـخـرىـ قـرـيبـةـ أـوـسـنـوـيـةـ،ـ وـهـوـيـطـبـقـ عـلـىـ تـنـهـكـ الـإـعـانـةـ لـمـدـدـ طـوـيـلـةـ،ـ أـوـقـدـ لـاتـسـمـ لـهـاـ بـهـاـ،ـ بـالـإـضـافـةـ إـلـىـ أـنـ بـعـضـ أـنـوـاعـ الـأـطـعـمـةـ يـرـهـقـ مـيزـانـيـةـ الـمـعـتمـدـ عـلـىـ الـمـعـونـةـ الـاجـتـمـاعـيـةـ،ـ وـهـلـ أـصـعبـ مـنـ أـنـ يـكـونـ سـعـرـعـبـوـةـ أـحـدـ أـنـوـاعـ الـعـيـاهـ الغـازـةـ "2"ـ يـورـوـ يـشـكـلـ نـسـبـةـ عـالـيـةـ مـنـ الـمـخـصـصـ الـيـومـيـ لـلـمـهـاجـرـ،ـ وـهـوـ أـقـلـ مـنـ 13ـ يـورـوـ،ـ



## Çavê Merov






Çav ji aliyê derva va bi birî, palikên çav û bijangan pêk tê. Wezîfa biriya ev e, ku nehêle qevçilî ji alê jor bikeve nava çav. hesîrê çavan li ser çavan belav hêşirê, ji livikên hêşirê yên çêkirin. Organa dîtinê çav gilorik e û ji aliyekî 23mm fireh e. Sêva Dema mirov ji kir, sê cureyên yekemîn spiyê spiyê çav da digire. Navê zanista tipê fireh û teng derve tarî bû, eger ronahî navça reşika Em bi alîkariya Reha dîtinê ji paşıya sêva çav. dinîrin, têن reflekte dîtine, ew enformasyon re dibe em ci dibînin.



Ev wezîfa wisâ jî palikê çavan û bijangan e. Palike çavan, dike da ku çav zuha nebe. Ava ku di dora çav da cih digrin, têن ya çava sêva çavî ye. Sêva heta aliyê din bi berayî çav bi çend qora pêk tê. 22 derve mêze sêva çav şêweyan dibîne. Ya çavê ye. Di nav reşika çav şûn reşika çavî di de îrîs e. Ev dibe. Ango eger ew fireh dibe û bû, teng dibe. Di çavî de bibik heye. bibikê dikarin bibînin. mêtû tê û digihîje Li wê derê tiştên ku em kirin û bi alîkariya birikên digihîjin mêtû û mêtû jî ji me

Sêva çavan bi alîkariya masûlkên dor çavan dilive.






## Rast

- 1 – alava bêhindan û bêhinkirinê li cem mirov – rojek ji hefteyê .
- 2 – bide min (b) – li hev komkirin .
- 3 – nave vê kovarê .
- 4 – ava baran û berfê ya bi hêz(b) – tembûr(b) .
- 5 – du tîp ji gotina (sarê) – tê vexwarin – terse erê .
- 6 – tîpin ji (dîdora) .
- 7 – parzemînek kevnar .
- 8 – atîn (belawela) – yara meme alan .

## Serjêr

- 1 – welitekî Asyewî .
- 2 – terse tûj (b) – ji keserê re – kê ? .
- 3 – hûn – gelo .
- 4 – hîmdarê abeya kurdî ya latînî .
- 5 – pil – hebûn û daxwaz .
- 6 – terse bûk (b) – zehmet(b) .
- 7 – deshilatek kurdî (1600 b.z) – hejmara piştî (29) .
- 8 – rojek ji hefteyek - hedan .



## Pend û Şîretên pêşıya

- 1 – Çav ji cavan şerimdikin !
- 2 – Hezar heval kêmin , û tenê dijminek pire !
- 3 – Bila yek kêt be û yek penêr be !
- 4 – Garis çendî bilind dibe , her ser bi jêr dibe !

## Ferhengok

- Rêname** = جواز سفر  
**Çakî** = الخير  
**Bedî** = الشر  
**Mafê rîgirtinê** = حق الفتىو  
**Hozan yarî** = فلسفة  
**Gefîn** = الارهاب  
**Peyman parêzî** = الوفاء  
**Hêrş** = حملة  
**Germolî** = الفوضى  
**Ramyarî** = سياسة

Peyva wendayî ji 10 tîpa ye nave mîrê helbestên Kurdan xwediyê destana Mem û Zîn

Van peyvan çıxêz bike

- AWERTE
- DADGEH
- ENCUMAN
- ALOZÎ
- ASO
- TÛM
- OLPERIST
- AŞTİXWAZ
- ARDÛ
- ATAX
- AVDAN
- OLDE
- ARGÛN
- ASRAX
- AHING
- MITÊL

A	W	E	R	T	E	X	A	S	O
L	E	N	C	U	M	A	N	Î	L
O	A	A	A	E	D	O	L	A	P
Z	R	V	A	H	I	N	G	E	E
Î	G	D	H	X	A	R	S	A	R
A	Û	A	M	I	T	Ê	L	E	I
R	N	N	D	N	A	D	Ê	R	S
D	A	R	D	Ê	A	T	A	X	T
Û	A	Ş	T	Î	X	W	A	Z	M
D	A	D	G	E	H	N	T	Û	M

\* PEYVA WENDAYÎ

--	--	--	--	--	--	--	--	--	--



# 2014

Sala we ya nû pîroz be

## Rojnameya 2014 an

**Çile**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4
5	6	7	8
9	10	11	12
13	14	15	16
17	18	19	20
21	22	23	24
25	26	27	28
29	30	31	

**Sibat**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4	5	6	7	8
9	10	11	12	13	14	15	
16	17	18	19	20	21	22	
23	24	25	26	27	28	29	

**Avdar**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4	5	6	7	8
9	10	11	12	13	14	15	
16	17	18	19	20	21	22	
23	24	25	26	27	28	29	
30	31						

**Nisan**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4	5	6	7	8
9	10	11	12	13	14	15	16
17	18	19	20	21	22	23	24
25	26	27	28	29	30	31	

**Gulan**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3
4	5	6
7	8	9
11	12	13
14	15	16
18	19	20
25	26	27

**Cotmeh**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4	5	6	7
8	9	10	11	12	13	14
15	16	17	18	19	20	21
22	23	24	25	26	27	28
29	30					

**Tirmeh**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4	5
6	7	8	9	10
13	14	15	16	17
20	21	22	23	24
27	28	29	30	31

**Tebax**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4	5	6	7	8
3	4	5	6	7	8	9	
10	11	12	13	14	15	16	
17	18	19	20	21	22	23	
24	25	26	27	28	29	30	

**Êlûn**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4	5	6
7	8	9	10	11	12
14	15	16	17	18	19
21	22	23	24	25	26
28	29	30			

**Ç . Pêşî**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4	5	6	7	8
5	6	7	8	9	10	11	12
12	13	14	15	16	17	18	
19	20	21	22	23	24	25	
26	27	28	29	30	31		

**Ç . Paşî**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4	5	6	7	8
9	10	11	12	13	14	15	
16	17	18	19	20	21	22	
23	24	25	26	27	28	29	
30							

**Bercile**

Şemi Yekşem Düşem Sêsem Çarşem Pêncem in

1	2	3	4	5	6
7	8	9	10	11	12
14	15	16	17	18	19
21	22	23	24	25	26
28	29	30	31		

معاً نصل  
إلى الحرية

Pêkve  
em  
bîgîhê  
Azadîyê



10/ديسمبر..اليوم العالمي لحقوق الإنسان  
**معاً ندعم المرأة السورية**

**ولات (ثقافية . عامة . مستقلة) . نصف شهرية**

welat.press@gmail.com

[www.facebook.com/Dengekurdistanasurya](http://www.facebook.com/Dengekurdistanasurya)

(العدد 7) 15 كانون الأول 2013